



Xwendevanê xweştivî:

Li piranîya welatan bi taybetî li welatên pêşkeftî mozexane hene. Di wan mozexaneyan da baştirîn şakarêن hunerê şêwekarîyê bi dirêjahîya dîrokê dihêne raxistin û salane bi milyonan evîndarêن hunerî sera wan mozexaneyan diden ji bo dîtina wan şakaran. Gelerîya Kepirê dê hewl det ku hewe yên xuştivî bi baştirîn şakarên hunerê şêwekarîyê li cîhanê aşîna biket bi hîviya wê rojê ya ku hûn bi xwe seredana wan mozexaneyan biken û wan şakaran bibînin.


Hunerê şêwekarîyê

Hunerê şêwekarîyê sê corêن hunerî bi xweve digrît:


Peykersazî : Formkirina şêwe û wêneyane di boşayê da bi sê alî: Bilindahî firehî û kûratî. Di peykersaziyê da gelek corên metriyalî bi kar dihên wek: teqn berda rasin zêr zîv bironê pilastîk û.... hitd.

Fênuşa Berî Dîrokê

Dihête gotin ku peyker kevintirîn corê hunerî ye. Ev peykere berî 22.000 salan ji berî kilsî hatîye çekirin. Bilindahîya wî 11 santîmetrin û di mozexaneyâ dîroka sirostî ya Viyana da ye. Ev peykere mezintirîn û navdartirîn peykerê serdema berî dîrokê ye.




Kepirê



Nijyarî : Ev hunere ji danana çend berekan li ser hev heta aloztirîn avahî û zexrefê bi xwe ve digrît. Vî corê huner peywendîyeka mukim bi merg û jîyanê ve hebû ye û heye û yekemîn avahîyên mirovan avakirîn yan xanî bû wîne ji bo ku têda bijîn yan jî gor bû wîne mirîyên xwe têda veşartîne.

Eve sadetirîn şêweyê endezyariya nijyarîyê ye ku bi tenê ji sê beran pêk dihêt. Li ber avahîyê katdiraiya bajêrê Rams haîye nijinîn.

Nîgar: Di vî hunerî da firçe û boyax û reng bi kar dihêن û yekemînnîgarêن hatîne kêşan li ser dîwarê şikefta bûn yan jî bo peristinê yan jî ji bo xweşkirina bextê xwe ne di wîre ji bo her du armancan jî bûwîne.



Ev nîgare li ser dîwarê şikefta Lasko li Firansa berî 19.000 salan hatîye kêşan.

